

## Nameyên Sersaxiyê

Gelekî zor e ku mirov di şîna dostekî, siyasetmedarekî mîna bavê Şiyar de his û hestê xwe bîne zimên...Belê em çi bikin?. Kes nikare li pêş qedere bisekine...

Tiştê ku ez dikarim di vê derbarê de bibêjim ev e: Stêrek geş ji asmanê siyaset û rewşenbîriya Kurdî rîjiya...Erê dema ku ez dibêjim rewşenbîrî, ji ber ku ew û partiya wî piştgirên rewşenbîran bûn. Rehmetî di vî warî de, ji bo rewşenbîran piştgirekî sereke bû, ta radeyekê ku weşanên partiya wî ta roja îro bi berdewamî têne weşandin, weke PIRS, NEWROZ . Û çalakiyên cure-cure, hersal ku partiya wî "Cejna rojnamegeriya Kurdî" saz dikir, rewşenbîr, nivîskar û rojnamevan kom dikir û gelek caran jî ew xelat dikirin...Ev çalakiyên ku me li rex parityên din nedîtine...

Belê, Kurd dibêjin: Ga dimire, çerm dimîne, mêr dimre, nav dimîne. Ez bi xwe bawer im wê navê bavê Şiyar wek aleke bilind di nav Kurdên Sûriyê de bimîne. Ji qencî, durustî, wefadarî, dûrî nijadperestiya teng û şoven ...Her û her wê bimîne wek sembolekê ji nifşên nû re...

Ji heval û hogirên wî bi hêvî me, ku li ser rêbaza wî bilivin, xwe jê nedin alî...

Serê malbat, partiya wî û gelê Kurd sax be!

**Konê Reş22/10/2010**

Bi dilekî kovan, ev gotinên han di nav coşa dilê min de radibin û datên, belav û kom dibin.

Mamosteyê hêja, ji 35 salan min ew nas dikir, mirovekî Kurd î dilsoz û bînfîreh bû, di xebata parastina gelê xwe de bê rawestan bû û karên wî, payebilind û bi kêrhatî bûn.

Mamoste Ismaîl Umer weke kesayetiyeye Kurdî û hevalên xwe xemxwarên parastina yekîtiya rêzên Kurdî bûn, çira û fenera şeva reş bûn...

Mamoste, di nav kar û xebata xwe û

## Nameyên Sersaxiyê

tevahiya dema wî de rewşenbîriya kurdî û rewşenbîrên Kurd her dem di hiş û bîra wî de bû. Ji ber vê jî, jimareke hêja ji rewşenbîran li dora wî û rêxistina wî bûn û bi alîkariya wan, berhemên hêja afirandin û weşandin.

Şîna mamoste Ismaîl Umer, şîna rewşenbîrên Kurd e.

Sersaxî ji bo malbata Ismaîl Umer, ji bo hevalên wî û ji bo rewşenbîrên Kurd.

Ez sersaxiyê ji bo hemû Kurdan dixwazin.

**Derwêşê Xalibê Derwêş22/10/2010**

Bi navê Girûpa Heseke ya rewşenbîriya Kurdî, em sersaxiya miletê Kurd dikin û bila serê millet sax be

Xwedayê mezin, gunehê wî bibûrîne , vê şîne şahî bigerîne, û cihê wî buhuşa rengîn bihêle.

Em bi hêvî ne ev komcivîn bo nêzîkbûnê di nav partiyên me de bibe navendok.

Mamoste Ismaîl, serokê partî û lawê miletê xwe bû, xwediyê sincên bilind rewiştên paqij bû. Ji kaniya zelal, şîrê xebatê vexwariye, mirovekî xwedî helwest, xwediyê hestên tenik û bihnek fireh bû. Mirovekî perwer û bîrwer bû. Û hûn bimînin bo kar û xebatê.

**Girûpa Heseke ya rewşenbîriya Kurdî**

19/10/2010

Partiya Yekîti ya Demokrat a Kurd li Sûriyê...Hevalên Komîta rêvebir

Bi koçkirina hevalê hêja Ismaîl Umer, û bi bihîstina vê nûçê, em pir dilêş û sergêj bûn. Lê, di demeke gelek giring de, li şîna vî mirovî valahiyek ma. Bêguman, hebûna vî mirovî cihê rastkirina şêwe, rêç û şivîlên bizava tevgera Kurdî li Sûriyê bû.

Vî mirovî di demeke kurt de, karîbû civata Kurd li Sûriyê bigihîne asteke bilind. Di dawî de, hêvî û omîda me ji Xwedayê mezin ew e, ku birayê me Ismaîl bi buhuşa xwe şa bike û wî têxe bin dilovaniya xwe û serê miletê Kurd sax be!

**Malbatên Berzençiyên li Qamişlo**